

Pêvajoya Penaberiye ya Hêsankirî

Pirsên Pir Dubarekirî (PPD)

Naverok:

Ev PPD ji bo kê ye?	2
Tiştên herî giring çî ne ku divê tu bizanî?	2
"Pêvajoya penaberiye ya hêsankirî" çî ye?	2
Wê çî bibe heke ez pirsyarnameyê tamam nekim û neşînim?	3
Gelo ez dikarim formê bixwe dagirim û bişînim?	3
Rîskên temamkirina pirsnameyê çî ne?	3
Şêwirmendekî diyarkirî yê koçberiyê dikare çawa bibe alîkar?	4
Heke şêwirmendekî min ê diyarkirî hebe - ez ê çî bikim?	5
Şêwirmendekî min ê diyarkirî tune ye - ez ê yekî çawa peyda bikim?	5
Parêzerên Alîkariya Hiqûqî	5
Şêwirmendên OISCê	5
Parêzerên Din	6
Gelo ez dikarim ji hevalê xwe alîkariyê bixwazim?	6
Çima di gelek rewşan de fikrekî xirab e ku ji hevalekî alîkariyê bixwazim?	6
Gelo rêxistineke penaberiye ya herêmî dikare bibe alîkar?	7
Heke ez formê paşve bişînim, ez ê kengê encamekê wergirim?	7
Min dirêjkirinek xwestiye - Ez ê niha çî bikim?	7
Heke doza min wekî hatî vekişandin bê nîrxandin divê ez çî bikim?	8
Kontrolkirina Qanûnî çî ye?	8
"Li ser angaşteke nû beyanên pêvekî" çî ye?	8

Ev PPD ji bo kê ye?

Ev PPD ji bo te ye, heke:

- Tu welatîyê Efxanistanê, Etîreyê, Libyayê, Sûriyayê yan Yemenê yî û
- Te beriya 28ê hezîrana 2022yan serî li penaberiyê daye, û
- Pirsnameyê penaberiyê dane te ku tu dagirî û paşve bişînî, û
- Tu ne zarokê bitenê yî

Heke tu nikaribî her çar xalên li jorê nîşan bikî, ev PPD ne ji bo te ye! (Dibe ku dîsa jî tê de ji bo te agahiyên bikêrhatî hebin...)

Tiştên herî giring çî ne ku divê tu bizanî?

- Heke te pirsnameyê penaberiyê wergirtibe, ji bo vegerandina wê moletê ango demêke diyarkirî heye
- Em pêşniyar dikin tu ji bo dagirtinê bi şewirmendekî koçberiyê yê diyarkirî bişewirî
- Heke tu şewirmendekî koçberiyê yê diyarkirî peyda nekî, tu dikarî dirêjkirina moletê bixwazî
- Dezgehên xêrxwaziyê û rêxistinên civakên koçberan dikarin ji bo dirêjkirina moletê bibin alîkar
- Heke tu ti tiştî nekî, dibe ku serlêdana te wekî vekîşandî bê qebûlkin - ev xirab e!

"Pêvajoya penaberiyê ya hêsankirî" çî ye?

Pêvajoya penaberiyê ya hêsankirî ji bo bilez biryardana hin dozên penaberiyê pêvajoyê nû ye. Ev sibata 2023yan ji aliyê Vîze û Koçberiya UKê ango UKVIyê ve hatiye nasandin - ku dezgeheke Wezaretê Karên Hundir e û bi serlêdanên koçberiyê û dozên penaberiyê re eleqedar dibe.

UKVI dê ji te re **'pirsnameyê penaberiyê'** bişîne û ji te daxwaz bike ku tu bi înglîzî dagirî û wê **di nav 20 rojên kar de** paşve bişînî. Ew ê ji bo biryardana doza te agahiyên tu bidî bi kar bînin.

Heke ew biryarê bidin ku mafê te yê penaberiyê yan parastina mirovî heye:

- Divê ew *bêyî ku* te vexwînin hevdîtina penaberiyê statuya te bidin te
- Em nizanin ka ew ê statuya te çiqasî zû bidin, lê temamkirina vê pirsnameyê tê wateya lezandina vê pêvajoyê

Heke ew ne ewle bin ku mafê te yê penaberiyê yan parastina mirovî heye:

- Divê ew te vexwînin hevdîtinekê
- Tu dikarî delîlên nû pêşkêş bikî
- Piştî hevdîtinê ew dikarin statuya te bidin te, lê ew dikarin red jî bikin.

Nabe ku tu bêyî hevdîtinekê bêyî **redkirin**.

Wê çi bibe heke ez pirsyarnameyê tamam nekim û neşînim?

Heke tu pirsyarnameyê di wextê wê de tamam nekî û neşîni, UKVI dikare ‘doza te wekî hatî vekîşandin binirxîne’

Ev ji redkirinê xirabtir e:

- Wê demê mafê îtirazê tune ye
- Êdî wê dozeke te ya penaberiya tune be ku tu li bendê bî
- Dibe ku tu êdî piştgiya penaberiya wernegirî
- Dibe ku tu hemû fêdeyên ji ber doza mafan yê beriya 28ê hezîrana 2022yan ji dest bidî

Dibe ku hê jî riyeke vê hebe (li jêrê binêre) lê ew ê dirêjtir dewam bike û dibe ku bibe sedema fêdeyên hindiktir

Heke tu di dema wê de ji bo alîkariyê kesî nebînî tu dikarî daxwaza dirêjkirina moletê bikî.

Gelo ez dikarim formê bixwe dagirim û bişînim?

Erê tu dikarî. Lê çêtir e tu ji bo alîkariyê şewirmendekî koçberiyê yê diyarkirî peyda bikî. Ji ber ku heke di formê de şaşî çêbin ev ê ji te re bibe rîsk.

Li jêrê derbarê şewirmendên koçberiyê yê diyarkirî de agahiyên zêdetir hene.

Rîskên tamamkirina pirsnameyê çi ne?

Çend tiştên di pirsnameyê de hene ku îhtîmal heye tu wan şaş çêkî:

- Agahiyên giring bihêlî û behsê nekî
- "Şaşiyên rastiyên diyar" (mînak şaşiyên derbarê jiyana te de)
- Daxilkirina agahiyên netêkildar
- Nezelalî yan jî tevlihevî
- Gotina agahiyeke nerast yan jî veşartina agahiyeke rast

Dibe ku bandora van tiştan hebe:

- Ka UKVI ji çîroka te bawer dike yan nake
- Ka UKVI bawer dike ku tu welatîyê wî welatî yî ku tu îdia dikî
- Ka UKVI bawer dike ku pêdiviya te bi parastinê heye yan na
- Heke tu di doza xwe de bi ser bikevî, dibe ku ev sûdê bide serlêdanên siberojê yê endamên malbata te yê ji bo hatina ba te

Wek mînak: Dibe ku UKVI bawer bike tu rastiyê nabêjî, heke:

- Tu bêyî ravekirinê tiştêkî ji tiştên te di hevdfîtin yan pirsyarnameyên berê de gotine cudatir bibêjî

- Tu di pirsnameyê de tiştên dijberî hev bibêjî
- Heke tu tiştêkî bibêjî û ew tişt li agahiyên li ber destê UKVIyê neke, agahiya li ser welatê tu jê hatî jî di nav de
- Heke tu tiştêkî ji UKVIyê veşêrî ku jixwe ew vê ji çavkaniyeke din dizane
- Heke tu tiştêkî te berê kiriye û UKVI pê dizane rave nekî
- Heke tu bi inglîzî peyvên nerast bi kar bînî yan jî amûreke wergerandinê ya online gotinên te şaş wergerîne

Heke ew bifikirin tu rastiyê nabêjî, dibe ku ew doza te red bikin. Dibe ku ew ji welatîbûna te jî bikevin gumanan.

Hin mînakên din yên şaşiyên pêkan hene:

- Heke tu agahiyên giring bihêlî û behsê nekî, dibe ku UKVI bifikire ku tu ne di xetereyê de yî û doza te ji ber vê sedemê red bike
 - Heke tu paşê behsê bikê, dibe ku ew bifikirin ku tu rastiyê nabêjî
- Heke tu ne zelal yan jî tevlihev bî yan jî behsa gelek tiştên netêkildar bikî, tu yê zehmet bikî ku ew biryareke rast bidin - dibe ku ew doza te şaş fêm bikin
- Heke tu ji bîr bikî ku behsa endamên malbatê yên li derveyî UKê bikî, ihtîmal heye ku serlêdana van endamên malbatê ji bo hatina ba te bê redkirin.

Pirsnameyê tu dagirî yan jî bi alîkariya hinan dagirî, dîsa jî ihtîmala pêkhatina van tiştan heye. Lê dîsa jî şêwirmendên diyarkirî yên koçberiyê dê baldar bin û hewlê bidin ku şaşî çênebin.

Divê bê diyarkirin ku armanca polîtîkayê ev e ku biryara dozan zû bê dayîn. Ji ber ku divê bêyî hevdîtinê red nekin, dabînkirina parastinê ji redkirinê zûtir pêk tê. Rêjeya dabînkirina par ji bo penaxwazên ji Efxanistanê, Etîreyê, Libyayê, Sûriyayê û Yemenê ji %95 bû. Loma redkirin hindik e. Lê dîsa jî, ji [polîtîkaya li ser Pêvajoya Penaberiyê ya Hêsankirî](#) diyar e ku UKVI hê jî li benda hin redkirinan e. Heta ku em zêdetir bizanin çêtir e em baldar bin!

Şêwirmendekî diyarkirî yê koçberiyê dikare çawa bibe alîkar?

Divê şêwirmendekî diyarkirî yê penaberiyê:

- Alîkariya te bike ku tu fêm bikî ka kîjan agahî giring û têkildar in
- Hevpeyvîn û belgeyên berê kontrol bike û derbarê hemû nakokiyên de ji te bipirse
- Piştrast bike ku pirsyarname wekî pêwîst e bi zelalî, rast û bi temamî hatiye dagirtin (yan jî ew dikarin daxuyaniyeke zelal û bêkêmasî pê ve bikin ku pirsan dibersivîne)
- Ji te re bibe alîkar ka divê tu kîjan delîlên heyî têxî navê
- Şaşiyên giring neke
- Agahiyên têkildar bi zanîna neguherîna yan veneşêre
- Beriya şandina pirsyarnameyê bi te re piştrast bike ku agahiyên te dane rast in

Peywira wan ew e ku li gorî fêdeyên te tevbigerin (wekî tu diyar bikî!) Heke şêwirmend tiştêkî zîrarê bide doza te bike tu dikarî giliyê wî bikî. Lê dîsa jî ew baweriya xwe bi gotinên te tînin, loma heke tu şaşiyekê bikî ew nabin berpirsyar - divê tu jî baldar bî!

Di gelek rewşan de heke kesekî nediyarkirî alîkariyêke wisa bide ev dibe sedema cezakirinê.

Heke şêwirmendekî min ê diyarkirî hebe - ez ê çi bikim?

Gelekî baş e! Demildest pê re bikeve peywendiyê û bipirse ka dikare ji bo temamkirina formê randevuyekê bide te.

Bêhnfireh be - dibe ku gelek kesên di vê rewşê de di dorê de bin.

Heke derfeta wî tune be ku te demildest bibîne, dibe ku daxwaza dirêjkirina moletê bike.

Şêwirmendekî min ê diyarkirî tune ye - ez ê yekî çawa peyda bikim?

Niha ev zehmet e. Li piraniya deverên welêt kêmasiya şêwirmendiya koçberiyê ya belaş heye. Dibe ku tu bi mehan li benda randevuyekê bimînî.

Parêzerên Alîkariya Hiqûqî

Vebijarka herî baş ev e ku tu parêzerekî alîkariya hiqûqî peyda bikî. Heke tu piştgiriyê penaberiya distînî mafê te yê alîkariya qanûnî heye. Her wisa dibe ku di hin rewşên din de jî mafê te hebe, heke dahata te yan jî teserûfên te hindik bin.

Her wisa:

- Divê parêzerê alîkariya hiqûqî azmûna koçberiyê derbas kiribe, ango divê zanîna wî hatibe testkirin
- Alîkariya hiqûqî dikare di mercên hewce de heqê wergerê, tercumeyê û raporên pisporan bide.

[Tu dikarî parêzerekî alîkariya hiqûqî ji virê peyda bikî.](#) Postkoda xwe binivîse. Piştirast bike ku te qutîka "Immigration or Asylum" ango Koçberî yan Penaberiya nîşan kiriye.

Şêwirmendên OISCê

Şêwirmendên OISCê di mijara koçberiyê de pispor in pêwist e wan jî azmûn derbas kiribe. Pêdiviya te bi şêwirmendekî heye ku pisporiya wî ya di kategoriya Penaberî û Parastinê de di asta 2yan de ye

Du cureyên şêwirmendên OISCê hene: "fee charging" û "non-fee charging" ango biheqê xwe û ne-biheqê xwe. Wateya fee charging ev e ku divê tu di gelek rewşan de pere bidî.

[Tu dikarî şêwirmendekî OISCê ji virê peyda bikî.](#) Postkoda xwe binivîse. Ji “Types of advice” vebijarka “L2 Casework” hilbijêre. Ji “Asylum or Immigration” vebijarka “Asylum And Protection Advice” hilbijêre. Li gorî pêdiviya xwe “Fee Charging” yan “Not Fee Charging” hilbijêre. Heke tu piştgiriya penaberiyê werdigirî, bi ihtîmaleke zêde heqê şêwirmend dê neyê dayîn. Gava mafê te yê alîkariya hiqûqî heye divê tu pere deyn nekî û nekevî bin deynan!

Şêwirmendên OISCê yên ne-biheqê xwe hewlê didin ku ji bo hin civakan yan jî komên bêparastin (yên wekî mirovên ji dever yan herêmeke diyar, penaber, jin, zarok û hwd.) bixebitin. Her wisa dibe ku ew xizmeteke diyar û sînorkirî pêşkêş bikin. Dibe ku şiyana wan tune be ku ji bo pirsyarnamê alîkariya te bikin. Lê dîsa jî dibe ku ew dikarin di hin mijarên din de bibin alîkar: wekî peydakirina parêzerekî alîkariya hiqûqî yan jî dirêjkirina moletê.

Parêzerên Din

[Tu dikarî ji virê ji malpera Civaka Hiqûqzanên parêzerekî solicitor peyda bikî,](#) ku parêzerên solicitor yên alîkariya hiqûqî jî di nav de ne. Kesên ku alîkariya hiqûqî nakin dê di gelek rewşan de ji te pere bixwazin. Heke tu piştgiriya penaberiyê werdigirî, bi ihtîmaleke zêde heqê vê dê neyê dayîn. Hin cureyên din yên parêzeran hene ku dikarin ji te re bibin alîkar lê ev ji yên din hindiktir û dûrtir in!

Gelo ez dikarim ji hevalê xwe alîkariyê bixwazim?

Ev bi piranî fikrekî xirab e. Lê dîsa jî ne qedexa ku hevalek ji bo dagirtina pirsyarnamê yan jî ji bo diyarkirina tiştên têxî navê alîkariya te bike, bi şertê:

- Tu ji bo vê pere yan diyarî nediyê (ji bo spaskirinê be jî!)
- Ew bi ti awayî ji bo rêxistineke ku alîkariya te dike çî bi heqê xwe çî bi dilxwazî naxebitin
- Ew alîkariya gelek kesên din ên di heman rewşî de yan jî pirsgirêkên penaberî an koçberiyê yên din nakin

Heke yek ji van rewşên jorê pêk bê, dibe ku hevalê te bê sûcdarkirin û ihtîmal heye bê cezakirin yan girtin.

Çima di gelek rewşan de fikrekî xirab e ku ji hevalekî alîkariyê bixwazim?

Gelek sedemên vê hene:

- Dibe ku inglîziya hevalê te ne baş be yan jî nikaribe zimanê te baş biaxive
- Dibe ku hevalê te wekî kesekî profesyonel yê perwerdekirî ne baldar be - dibe ku ew şaşiyên bike yan jî te şaş bide fêmkirin û agahiyên şaş binivîse
- Dibe ku hevalê te nizanibe ka çî têkildar yan jî giring e
- Dibe ku hevalê te ji jargon û têgehên qanûnî yên têkildar fêm neke û dibe ku pirsan şaş wergerîne an şaş şîrove bike û bibe sebeb ku tu bersivên şaş bidî.

- Dibe ku tu ji hevalê xwe re tiştên zehmet yan jî tiştên te bide şermê bibêjî - dibe ku ev bandorê li hevaltiya we bike
- Dibe ku tu barekî nemaqûl didî ser milê hevalê xwe - ev karekî zêde ye û heke doza te bi derengî bikeve yan jî bi ser nekeve ew ê xwe berpîrs bizane
- Heke ew naskiriyekî ji rêzê yan jî hevalê hevlekî be, nexwe dê motîvasiyona wî ya ji bo baldarbûnê yan jî tevgera li gorî fêdeyên te hindik be

Dibe ku sedemên zêdetir hebin!

Gelo rêxistineke penaberiyê ya herêmî dikare bibe alîkar?

Rêxistinên penaberan yê herêmî û dezgehên din, tenê heke ew ji aliyê Ofîsa Komîsyona Xizmetên Koçberiyê (OISC) ve bi asta 2 yan jortir hatibin diyarkirin, dikarin ji bo temamkirina formê bibin alîkar. (Li jorê binêre.) Gelek hindik dezgeh di vê kategoriyê de ne. Heke ew vê dikin jî ew ê nikaribin alîkariya hemû kesan bikin.

UKVI plan dike ku di demeke kin de 12.000 ji van forman çap bike. Ji bo temamkirina her formê dê hejmareke nediyar ya saetan hebe. Piraniya rêxistinên ku ji bo şêwirmendiya koçberiyê hatine diyarkirin, li ser kapasîteya xwe dixebitin û hewlê didin ku daxwazên heyî bicî bînin.

Dibe ku rêxistin dikaribin ji bo alîkariyê hin tiştan bikin, wekî mînak:

- Berê te bidin şêwirmendên koçberiyê yê diyarkirî, heke pêkan be (lê ev ê bi piranî di demeke kin de pêk neyê)
- Ji bo daxwaza dirêjkirina moleta temamkirina formê alîkariya te bikin ku tu bikaribî di wê maweyê de li şêwirmendekî bigerî

Dibe ku ew dikaribin formê bi zimanekî tu jê fêhm dikî bixwînin. Lê dîsa jî ji ber dirêjîya formê dibe ku ev heqekî zêde yê tercumanîyê bixe ser milê wan, loma dibe ku ew vê red bikin.

Heke ew nediyarkirî bin, dibe ku ew ji bo dagirtina formê alîkariya te nekin.

Heke ez formê paşve bişînim, ez ê kengê encamekê wergirim?

Bersiva kurt: em nizanin. Lê dîsa jî peywira polîtîkayê ev e ku di mercên pêkan de encamên pozîtîv bilez bide wergirtin, loma dibe ku tu zêde li bendê nemînî.

Min dirêjkirinek xwestiye - Ez ê niha çi bikim?

Divê Wezareta Karên Hundir bersiva daxwaza te bide. Heke te daxwazê bi serê xwe, bi alîkariya hevlekî yan jî dezgeheke xêrxwaziyê ya herêmî kiribe, **divê tu ji bo bersivê qutîka xwe ya postê, email û hwd. kontrol bikî.**

Heke ew bersivê bidin, dibe ku ew demeke ji dema te xwestî kintir bidin. Dibe ku hewce bike tu dirêjkirinê ne tenê carekê bixwazî.

Dawiya dawî, armanca vê yekê ev e ku tu ji xwe re nûnerekî qanûnî bibînî, loma jî ji kerema xwe re hewlê bide!

Heke doza min wekî hatî vekîşandin bê nirxandin divê ez çî bikim?

Wê demê mafê îtirazê tune ye. Heke sedem têmekirina demê de, tu dikarî ji Wezareta Karên Hundir re (asylumcustomercommunicationshub@homeoffice.gov.uk) binivîsî û daxwaz bikî ku doza te dîsa bê vekirin û rave bikî ka çima te pirsyarname di dema wê de venegerandiye.

Heke ew red bikin, du ihtîmal dimînin:

- Di pêvajoya Kontrolkirina Qanûnî re derbas bibî
- "Li ser angaşteke nû beyanên pêvekî" pêşkêş bikî

Kontrolkirina Qanûnî çî ye?

Gava dezgeheke dewletê (di vê rewşê de UKVI) tiştê neqanûnî, nerasteqîn yan jî *gelekî* nemaqûl bike tu dikarî ji bo kontrolkirina qanûnî serî li mehkemeyê bidî. Heke tu kesek ji wan kesên pêşî yî ku doza te wekî hatî vekîşandî hatiye nirxandin, dê parêzer hebin ku bixwazin alîkariya te bikin. Lê dîsa jî heke Kontrolkirina Qanûnî ya pêşî ya van dozan bi ser nekeve, dibe ku riyeye din nemîne.

Kontrolkirina Qanûnî buha ye. Ew bi nameyeke ji bo UKVIyê dest pê dike ku ji wan tê xwestin ji dêvla çûna dadgehê biryara xwe vekîşînin. Heke UKVI vê red bike, paşê tu serî li mehkemeyê didî. Di serlêdaneke mehkemeyê de tenê parêzerekî 'solicitor' yan jî parêzerekî 'barrister' dikare te temsîl bike. Şêwirmendekî OISCê yê bi asta 3yan dikare ji bo te nameya pêşî binivîse. Heke doza te têra xwe xurt be tu dikarî ji bo dana heqê temsîlkarê xwe yê qanûnî alîkariyeke qanûnî wergirî.

Heke Kontrolkirina Qanûnî bi ser bikeve, tu yê statuyê wernegirî. Ji dêvla vê ve tu yê vegeerî rewşa beriya ku doza te wekî hatî vekîşandî hatibû nirxandin.

Ji bo serlêdana Kontrola Qanûnî moletek heye - divê tu vê di dema herî nêzîk de bikî û di nav 3 mehên piştî wergirtina biryara ku doza te wekî hatî vekîşandin hatiye nirxandin de.

"Li ser angaşteke nû beyanên pêvekî" çî ye?

"Beyanên pêvekî" delîl û argûmanên qanûnî yên nû ne ku her çend penaberîya te hatibe redkirin yan jî doza te wekî vekîşandî hatibe nirxandin jî, diyar dikin ka çima divê tu wekî penaber bêyî qebûlkirin. Pêwîst e ku tu bi xwe vê radestî Wezareta Karên Hundir bikî ku bi piranî li Liverpoolê ye.

Gava Wezareta Karên Hundir beyanên pêvekî wergirtin, dikare yek ji van sê tiştan bike:

- Mafê penaberîyê yan jî mafê parastina mirovî bide te.

- Beyanan red bike lê qebûl bike ku angaşteke nû heye; ev mafê îtirazê dîsa dide te
- Red bike ku beyanên pêvekî angaşteke nû ne

Ji bo ku beyanên pêvekî wekî angaşteke nû bî qebûlkin, divê tiştê nû hebe ku berê nehatiye behskirin. Heke doza te wekî hatî vekîşandî bê nixandin nexwe UKVI dê ti tiştî li ber çavan negire û her tiştê dê wekî nû be. Loma heke doza te bê redkirin *divê* mafê te yê îtirazê hebe.

Dezavantaja mezin ya pêşkêşkirina beyanên pêvekî ev e ku doza nû dê wekî ku piştî 28ê hezîrana 2022yan hatî vekirin bê qebûlkin. Wateya vê ev e, dibe ku heke doza te wekî hatî vekîşandin nehatibûya nixandin te yê statuyeye hêjatir wergirta. Dibe ku ew bibêjin, angaşta te ya nû nayê qebûlkin. Lê dîsa jî îhtîmala vê kême.